Vestfold og Telemark
FYLKESKOMMUNE

# Kontrakta kirêkirina laptopê (PC)/tablêtê û deynkirina kereseyên hînkirinê yên belaş navbera

Şaredariya parêzgeha Vestfold û Telemark
(org.nr. 821 227 062)
û
{navnElev} - {fodselsnummerElev}

## 1. Bi giştî

### 1.1. Aliyên kontraktê

Kontrakt di navbera Şaredariya parêzgeha Vestfold û Telemark (şaredariya parêzgehê) û xwendekar wekî kirêdar de hatiye girêdan. Dema ku şaredariyên parêzgehên Vestfold û Telemark bêne dabeş kirin, ev Kontrakt dê ji Şaredariya parêzgeha Vestfold û Telemark werê veguheztin bo Şaredariya parêzgeha Telemark an Şaredariya parêzgeha Vestfold, li gorî ka dibistana te li kîjan parêzgehê dikeve.

Di rewşên ku xwendekar ne di temenê qanûnî de ye, kontrakt bi welîemrê xwendekar re wekî kirêdarê berpirsiyar tê girêdan.
Bi îmzekirinê, ez piştrast dikim ku min naveroka vê belgeyê xwendiye û şert û rêwerzên şaredariya parêzgehê ji bo bikaranîn û miamelekirin digel laptopa (PC)/tablêta xwendekar (ji vir û pêde wekî PC tê binavkirin) û materyalên (melzeme) hînkirinê yên belaş qebûl dikim.

Kirêdariya di navbera şaredariya parêzgehê û xwendekar de li gorî şertên di vê kontraktê de hatiye rêkxistin.

Ev kontrakt bi dîjîtalî li vir hatiye îmzekirin: https://elevkontrakter.vtfk.no/

### 1.2. Mafê milkaniyê / Mafê bikaranînê

Alavên/materyalên hînkirinê yên ku dikevin ber vê kontraktê, milkê şaredariya parêzgehê ne. Heya ku PC neyê kirîn û xwemalîkirin (prîvatîzekirin), xwendekar tenê mafê bikaranîna wê heye.

## 2. Kirêkirina Laptopê/tablêtê

### 2.1. Alavên komputerê û programên ku dikevin ber kontraktê

PC / MACBook tevî şarjker û her alavên pêvek dikevin ber vê lihevhatinê. Di haletên zirargihiştinê an windabûnê de, şertên vê kontraktê ji bo PC-ya bideyndayî jî derbas dibin.

Ji bilî pergala xebitandinê (operativsystem), ev nermalav (programên kompyûterê, programvare) yên jêrîn li ser PCêye têne saz kirin:

- programa nivîsgehê (Office365)
- programa antîvîrûsê
- nermalavên din ku dibistan di perwerdehiyê de bikar tîne

## 2.2. Bikaranîna alavan

## Li ser xwendekar ferz e ku

- agahdar be ku alav li hember zirar û diziyê bi rêkûpêkî hatine ewlekirin (mînak, wan di dolabeke kilîtkirî ya cihê de hilîne, di çenteyekî de ji cî biguhe, qapaxeke parastinê ji baranê bikar bîne û di dema rêwîtiyê de bi xwe re wekî bagaja destan bibe)
- PC-ê bi deyn nede kesên din an jî wê ji ber çavan dûr nehêle
- Nermalavên zirarmend/neqanûnî an jî yên din li ser PCêyê saz neke
- Nermalavên ku berê li ser PC-yê hatine saz kirin bêyî destûra taybetî ji dibistanê neguherîne/kopî neke
- kopîkirina ewlehiyê (sikkerhetskopi) bi rêkûpêkî bike
- Nîşankirinê (navnîşana cureyê alavê, hejmara çêkirinê a fabrîkê û tiştên wekî wan) ji makîneyê raneke
- Makîneyê bi tu awayî nîşan neke, ne bi lesqeyan jî.

Ger li ser PC-ê gumanbariya vîrûs/bernameyên zerardar hebe, divê xwendekar bi beşa IT-ê re têkiliyê dayne ji bo ku PC ji nû ve were sazkirin. Ger gumanbarî hebe an jî were kifş kirin ku PC bi rengekî ne asayî hatiye bikaranîn, dibe ku beşa IT bixwaze ku PC ji bo vekolînê were radest kirin. Ger xwendekar makîneyê radest neke, dê nasnameya bikarhêner (brukerident) heya agahdariyek din were astengkirin.

Heya ku kirêya 3 salan neyê dayîn û PC neyê prîvatîzekirin (xwemalîkirin) piştî qedandina dibistanê, dê xwendekar mafên birêvebirina PC-yê wernegre.

Bikaranîn li gorî rêziknameya şaredariya parêzgeha Vestfold û Telemarkê a derbara dibistanên amadeyî de tê tenzîmkirin.

## 2.3. Servîs û garantî

Liser xwendekar ferz e ku PC-yê ji boyî nûvekirina pêwist, rastkirina xeletiyan û servîsê radestî xebatkarên teknîkî yên beşa IT bike. Ger xwendekar bi xwe, yan jî destûrê bide kesên din ku destwerdanê di PC-yê de bikin, ev dê bibe sedema windakirina garantiyê. Ev dibe ku bibe sedema mecbûriyeta dayîna tezmînatê ji aliyê xwendekar ve. Ger hewce bike, dibistan dê alavên pêwîst têxe ber destê xwendekar. Divê xwendekar dozên garantiyê (tezmînatê) bi domdarî ragihîne, û herî dereng heya 20ê Hezîranê ya sala xwendinê ya sêyem piştî girêdana kontraktê. Ev di heman demê de ji boyî zirara ku dighije PC-ya deynkirî jî derbas dibe.

## 2.4. Ziyan

Hemî xeletiyên amûran û hem jî ziyan û windahî divê di fersendeke herî zû de, herî dereng di nava 14 rojan de,  ji dibistanê re were ragihandin.

Divê xwendekar hewl nede ku zirarê bi xwe tamîr bike, lê vê yekê ji dibistanê re bihêle. Tamîrkirina ku ji hêla kesên din ve ji xeynî xizmetguzariyên pejirandî ve hatiye kirin wê bibe sedema nedana berdêla amûran.

Windakirin an zirara ku ji ber xemsariya xwendekaran çêbibe dê tezmînata wê li xwendekar were barkirin.

Mînakên xemsariyê dikarin ev bin:
- Vexwarin an aviyên din ku bi ser makîneyê de rijiyane.
- Depokirina vexwarinan/avîyan di heman çenteyî/kîsikî de ku PCê têde ye
- Veguhestin an destwerdana bêberpirsiyarî
- Zirargirtina PCêyê di dema ajotina wesayiteke bi motor de
- Danîna PCêyê li cihekî ne ewledar, bo nimûne, li bilindahiyê, li erdê an li ser kenarekî, hwd.
- Bikaranîn li cihên ne guncaw hwd (mînak li nêzî qûmê, axê, avê, alavên lihêmkirinê an makîneyên din ên ku dikarin zirarê bidin PCê di kargehê û cihên mîna wê de.)
- Dûr ji çavan hêlana PC-ê ji hêla xwendekar bi xwe an jî ji hêla hevalên xwendekar ve.
- Zirargirtina PC-yê di dema girtina PCêyê de bi rêya hebûna tiştekî di navbera ekranê û klavyeyê de.
- Ziyangirtin ji ber danîna nerast a PC-ê ku dibe sedema rûniştina te / yên din li ser PCêyê.

Di bûyera zirargirtinê de, pêdivî ye ku pereyên para şexsî were dayîn. Para şexsî dê li gorî asta zirarê biguhere.

Ger zerar wekî xemsariyê were nirxandin, divê xwendekar bixwe lêçûnan (mesrefan) bi xwe bide.
Di bûyera xemsariyê de ku dibe sedema xerabûna PCêyê, xwendekar divê li gorî rêwerzên heyî yên şaredariya parêzgehê mesrefa tamîrê bide an jî nirxê mayî yê PC-yê bide.

## 2.5. Dizî
Di bûyera diziyê de, xwendekar divê tavilê vê yekê ji polîs re ragihîne, û dibistan jî divê kopiyeke rapora diziyê werbigre. Ger PC ji dolaba quflekirî a xwendekar an ji odeyeke li dibistanê were dizîn beyî ku rapora polîs were çêkirin, xwendekar dê bi tevahiya bihayê wê were barkirin ji ber ku hingî dizî dê weku xemsariyê were hesibandin.

Diziya ji cihên prîvat an giştî, dibistan jî di nav de, divê ji aliyê sîgortaya xwendekar/welîemrê wî ve were sîgortekirin.

## 2.6. Mafê wergirtina amûran bi milkanî
## Bi giştî li ser wergirtina amûran bi milkanî
Ji boyî wergirtina PC-ê bi milkanî, divê xwendekar kirêya sê salan dabe û dibistan qedandibe. Dûv re PC tê vekirin da ku xwendekar bikaribe wê bixwe îdare bike. Lîsensa MS Windows-ê tê berdestkrin, lê ne lîsensa programa Office. Hemî programên din dê werin jêbirin.

## Xwendekarê veguhestî
Ger xwendekar biçe dibistanê li derveyî welêt, ew dikare PC-ya xwe bi xwe re bibe wir. Di rewşa nebûna ji şeş mehan zêdetir de, divê PC ji boyî bikaranîna prîvat were saz kirin û xwendekar divê

diravê kirêya mayî bide. Dûv re xwendekar dibe rêvebirê laptopê, û li gorî hewcedariyê dikare bernameyan saz bike. Dema ku xwendekar piştî bidawîbûna dema pevguhastina xwendekaran vedigere dibistanê, divê xwendekar bi rêvebirê IT-ya dibistanê re têkiliyê deyne da ku PC ji nû ve ji bo bikaranîna li dibistanê were sazkirin.

## Guhertina dibistanê

Ger xwendekar di dibistanên giştî yên şaredariya parêzgehê de dibistanê biguhere, divê xwendekar PC-ya xwe bi xwe re bîne dibistana nû.

Ger xwendekar here dibistaneke taybet an here dibistaneke giştî li parêzgeheke din, divê Kontrakta kirêkirinê ya bi şaredariya parêzgehê re were qedandin, yan bi dayîna kirêya mayî li gorî mafê di rêziknameyên xala 19-6 ya Qanûna Perwerdehiyê de an jî PC-êyê vegerîne. Divê xwendekar bixwe bi dibistana nû re têkiliyê deyne ji bo wergirtina agahdariyan li ser ka kîjan qaîde derbas dibin.

## Devjêberdana dibistanê

Ger xwendekar beriya 1ê Çiriya Pêşiyê (oktober) ya heman payîzê dev ji dibistanê berde ku lê ev kontrakt hatiye îmzekirin, mafê xwendekar tune ku PC-yê werbigre, û divê ew wê ji dibistanê re vegerîne. Ger xwendekar piştî 1ê Cotmehê dev ji dibistanê berde û bixwaze PC-ya xwe ji xwe re bihêle, divê ew diravê kirê yê mayî bide. Ger xwendekar piştî 1ê Cotmehê dev ji dibistanê berde û nexwaze PC-ya xwe ji xwe re bihêle, divê xwendekar kirêya sala xwendinê ya ku dest pê kiriye bide.

## Beşên din ên xwendinê, bo nimûne xwendina îzafî ji boyî wergirtina bawernameya xwendinê li zankoyan.

Xwendekar dikare heman PC-ya ku piştî Vg2 hatî desteser kirin di xwendina peyre di nava sînorê şaredariyên parêzgeha Vestfold û Telemark de bikar bîne.
Ger xwendekar jixwe PC-ya xwe tune be, xwendekar dikare PC-yekê ji dibistanê li ser salekê kirê bike û divê ev PC piştî bidawîbûna kursa xwendinê ji dibistanê re were vegerandin. Divê xwendekar Kontrakta kirêkirinê îmze bike.

## 3. Deynkirina pêdiviyên hînkirinê yên belaş

Ev Kontrakt ji bo tevahiya dema dibistanê an jî her carê ji bo saleke xwendinê ji bo wergirtina materyalên hînbûnê yên belaş ên ku dê di dawiya /devjêberdana dibistanê de werin radestkirin, derbas dibe.

Weku beşek ji pergala deynkirinê, divê xwendekar û dêûbav vê kontraktê îmze bikin, ku şert û mercên deynkirin û bikaranîna milkê dibistanê vedibêje.
Pêdivî ye ku hemî deyn bi navê xwendekar di pergala deynkirinê a pirtûkxaneyê de bêne tomar kirin.

BİXWÎNE - Piştî qedandina dibistanê, qedandina dersan an qutbûnê ji dibistanê, divê hemî materyalên fêrbûnê li dibistanê werin vegerandin. Materyalên fêrbûnê yên ku di dema lihevkirî de nehatine radest kirin, wekî kirîn têne hesibandin, û dê fatûreyek ji xwendekar / weliyê wî re were şandin. Bihayê kirîna rastîn dê were fatûrekirin.

### Bikaranîna amûran:

Hemî materyalên hînkirinê yên ku xwendekar deyn dike milkê dibistanê ne. Ger xwendekar di sala xwendinê de ji dibistanê derkeve, divê demildest hemû materyalên hînkirinê bên vegerandin.

Divê xwendekar:

- bi awayekî berpirsiyarane miamelê digel materyalên fêrbûnê bike, da ku ew zû nedirrin û zirara nehewce neghije wan.
- Di pirtûkên deynkirî de qelema nîşankerinê bi kar neyne, binê têkstan xêz neke an jî notan nenivîse.
- Agadar be ku taga barkodê/RFID, yan rûpel ji materyalan winda nebin an şil nebin, û her wusa pîs nebin an bi awayekî din zêdeyî normal neqetin û nedirrin.

Di rewşa windakirinê, zirargihiştinê an jî xirabbûna materyalên fêrbûnê de, liser kesê ku li binî imze kiriye berpirsiyariya dayina tezmînatê heye. Daxwaza tezmînatê bi paşve nayê kişandin her çende materyalên fêrbûnê piştî muhletê werin radest kirin jî. Di rewşên taybetî de, daxwazên tezmînatê dikarin werin rakirin.

## 4. Dayina pereyan û imzekirin

Ji bo PC-ya xwendekaran, divê xwendekar sê salan kirêya salane bide. Xwendekar di her saleke xwendinê de carekê bi riya çareseriya diravdana elektronîkî ya şaredariya parêzgehê pereyan dide. Kirê qasî rêjeya herî nizm a alîkariyên amûrane ku Lånekassen dide û ew jî salane tê sererast kirin.

Di rewşa daxwazkirina tezmînatê de ji ber nevegerandina materyalên fêrbûnê yên belaş an jî xemsariyê li gorî Kontraktê, xwendekar dê fatûreyekê werbigire. Eger xwendekar tezmîbate nede, xwendekar dê bîranînek nivîskî werbigire û were agahdarkirin daxwaza tezmînatê ji şirketeke berhevkirina deynanre hatiye şiyandin. Şaredariya parêzgehê dikare mafê berhevkirina pereyan bide aliyekî din.

Ji bo şagirtên di bin 18 saliyê re, welîemr ku wek kirêdarekî berpirsiyar îmze kiriye, dê berpirsiyar be ji her pereyên ku ne hatine dayîn .

## Kontrakta kirêkirina laptopê / tabletê û deynkirina materyalên fêrbûnê

Ez piştrast dikim ku min naveroka vê belgeyê xwendiye.
Bi îmzeya xwe, ez şert û mercên şaredariya parêzgehê ji bo bikaranîn û miamelekirina PC-ya xwendekar û şert û rêwerzên ji bo bikaranîn û miamelekirina materyalên fêrbûnê yên min bi deyn wergirtine qebûl dikim.

Kontrakt li gorî Qanûna Perwerdehiyê § 3-1 (9) hatiye amadekrin, li mersûmê tenfîzî yê Qanûna Perwerdehiyê § 19-6 binêre.

Xala 19-6. Berpirsiyariya darayî ya şaredariya parêzgehê li hember mesrefên tekildarî malzemeyên hînkirinê û alavên hînkirinê wiha ye:
'Ji 1'ê Tebaxa 2007'an de, divê xwediyên dibistanan ji şagirtên di qonaxa amadeyî ya 2 de ne materyalên hînkirinê yên çapkirî û dîjîtal û alavên dîjîtal ên pêwîst tamîn bikin. Ji 1 Tebaxa 2008an û bi şûn de, şaredarî berpirsiyare li hember xwendekarên qonaxa 3yan, û ji 1 Tebaxa 2009an, şaredarî berpirsiyare li hember xwendekarên qonaxa 1ê de.
Ger xwediyê dibistanê perwerdehiyê rêkbixe bi rengekî ku ji xwendekaran re hewcebûn bi komputerek laptop heye, dibistan dikare ji xwendekaran daxwaza dayina para şexsî a salane bike da ku beşekî ji mesrefên PC-yê werbigre. Çênabe ku para şexsî ji rêjeya bexşînê (minhe/stipend) ya herî hindiktir di minheya alavan ya salane de ku bi hatina diravî a xwendekar ve ne girêdayî ye. Piştî dibistana amadeyî, dê PC-ê ji xwendekar re bimîne.
Xwendekarên ku perwerdehiyê naqedînin dê li wan were pêşniyar kirin PC-êyê bikirin. Divê tevahiya bihayê wê ji sê qatên rêjeya bexşînê (minhe/stipend) ya herî hindiktir di minheya alavan ya salane de ku bi hatina diravî a xwendekar ve ne girêdayî ye, û ku ji roja qutbûnê ji dibistanê de tê hesibandin.'

Bi nivîsîn û imzekirina kontraktê re, Qaideyên Qanûna Kirînê têne rakirin, li § 3 binêre.
Xala 3 dibêje: 'Bendên qanûnê derbas nabin eger di Kontraktê de tiştekî din hatibe, eger di navbera aliyan de pratîkeke sazkirî hebe, an eger di navbera aliyan de ‘irf û adetên bazirganiyê hebin ku aliyan girêdidin.'

Cihê lênêrîna nakokiyên têkildarî vê Kontraktê dadgeha navçeya Nedre Telemark e (Nedre Telemark tingrett).

Şaredariya parêzgeha Vestfold û Telemark
Cih û dîrok: Skien, tebaxa 2023an



Helge Galdal
Rêvebirê daireya perwerdehiyê û saxiya gel

## Xwendekar û welîemr

| Cî û tarîx | Li jêra 18 salan – Imzeya welîemrê berpirs: |
| --- | --- |
| Navê xwendekar (tîpên mezin) | Navê welîemr (tîpên mezin) |
| Imzeya xwendekar | Imzeya welîemr |